

## NEZANBÛN NE ŞERM E, LÊ FÊRNEBÛN ŞERM E

Gotineke pêşiyên kurdan heye, dibêje; *`Bavo, min ê diz girt. Bavê wî dibêje, `Kurê min wî berde!`. Kurik dibêje, `Bavo, ez wî berdidim, êdî ew min bernade!`*

Niha kurdên me yên li Bakurê Kurdistanê mezin bûne û rewşa zimanê tirkî wiha ye. Dewleta Tirk bi darê zorê, bi perwerdeyê, bi sazûmana xwe zimanê tirkî xist nava dev û diranên wana. Lê niha zimanê tirkî ji wana re dibêje ku, *`Heyra qurba, wa ye zimanê te azad bûye, êdî dev ji min berde, biçê bi zimanê dayîka xwe biaxive!`*. Lê kurdê me dibêje, *`Na, ez dev ji te bernadim. Tu delala dilê min î!`*

Roj 24 saetan zimanê tirkî xistine devê xwe û wekî benîştê benê dicûn. Yên bi kurdî dizanin jî bi tirkî diaxivin. Qet ji xwe şerm jî nakin. Qet pozê wan jî naşewite. *`Kuro tu çima bi zimanê dayîka xwe naaxivî?`* Dibêje, *`Tirkî rehetir e!`* Dê were xwe aciz neke û dê were wî wekî kurd bihesibîne!` Lê dema tê ser axaftinê û zirdayîne jî xwe bi sed kesên bi kurdî diaxivin nade. Li gorî wî, ew siyasetmedarê herî mezin, rewşenbîrê herî girgîre û sosyalîstê herî kuşkuşe ye. Deh şoreş çekiriye, deh welat safî kiriye! Lê bi zimanê dayîka xwe naaxive. Tirkî jê re rehetir tê. Zahmetê nade xwe ku kurdî fêr bibe, bikar bîne, li pêş bixe. Ev kes di teşeya xwe de kurd be jî û ji bo kurditiyê bêje ku têkoşînê dide jî, giyana wî, hestên wî, mejiyê wî jî kurdinî dûr ketine û tirkî tê de bi cih bûye. Tu dixwazî bila aciz bibe û biçê serê xwe li dîwaran bide, ew kurdekî tirk e. Çawa ku tirkî dibêje, *`Her kesê xwe tirk bihesibîne tirk e!`* Ez jî dibêjim ku; *``Her kesê li şûna zimanê dayîka xwe 24 saetên rojê bi tirkî biaxive ew kurdê tirk e.``*

Dema tu ji wana re dibêji, kuro ka bi kurdî biaxive! Tu çima bi kurdî naaxivî? Dibêjin; *Ê ma wa ye cerdewan jî bi kurdî diaxivin, lê pis in; ez bi tirkî diaxivim, lê ez baş im.`*

Ma niha ev parastinek e? Ev tenê durûtî û demagojî ye. Bi vê yekê dixwazin ser tirkitiya xwe binixumînin. Qaşo ew şoreşger e, jî bo wê dikare bi zimanê tirkî biaxive û pêwîst nake bi zimanê dayîka xwe bipeyive. Ew şoreşgertiya te jî me re ne lazim e. Ger tê şoreşgerekî jî zimanê dayîka xwe direve bî, bavo wê şoreşgertiyê jî neke; me jî te qebûl e. Li malika xwe rûnê; qe ne tê bi tirkitiya xwe derûdora xwe asimîle nekî. Ziman zimanê netewekê ye, zimanê gelekî ye. Wê di nava wê netewê de yên cerdewan jî, yên faşîst jî hebin; yên milîs û yên şoreşger jî hebin. Kesek nikare bêje, wele ez şoreşgerim, jî bo wê bi zimanê dayîka xwe neaxivim jî dibe. Tu dixwazî kurê pêximber be; pîvana şoreşgertiya te xwedîderketina li nîrxên te yên netewî ye ku di serkê vê de jî zimanê dayîkê tê. Te zimanê dayîkê xistiye zîndanê, te tirkî di kesayeta xwe de bilind kiriyî, gelo tu çi kes î?

Di nava gel de, ji gel re civînan li dar dixin bi tirkî! Bi hevalê xwe re kom dibin, bi tirkî! Dinivîsînînin bi tirkî! Dixwînin bi tirkî! Êdî emê çi li we bikin. Hawar ji destê we! Partî biryarê distîne; kongre biryarê distîne; civat biryarê distîne... tev biryarê distînin, dibêjin; *``Bila her kes bi kurdî biaxive, bi kurdî binivîsîne, kurdî bikar bîne``*; mêrik/jinik dîsa jî ne xema wî/wê ye, tirkiya xwe didomîne. Xwezi tirkiya wî/wê tenê bi wî/wê bitixûb maba, na! Li derûdora xwe jî vedigrîne, belavî her derê dike. Diçe ku wekî saziyeke asimilasyonê ya tirkitiyê bikeve wir; civatê tev dike nava axaftin û dayînûsitendina bi tirkî. Dê were safî bike! Dayîkên me jî li welêt her roj sînga xwe didin ber tanq û panzêran diqêrin, dibêjin *`Em zimanê xwe dixwazin!`* Hevalê me, dostê me, şoreşgerê me jî zimanê hazir mazir dev jê

berdide û bi zimanê dijmin diaxive û ji vê yekê qet şerm nake, pozê wî/wê naşewite û bi ser halan de zimanê dayîka xwe biçûk dibîne, dibêje; ``tirkî hêsantir e``.

Li gorî mejiyê tirkitiyê zimanê tirkî ji xwe zimanê herî sereke yê cîhanê ye û ew hevalê me yê di kodika tirkitiyê de mezin bûye ji bi vî mejiyî dihizire. Mejiyê wî ne azad e. Dibe ku di refên şoreşê de be; dibe ku kedê jî dide; dibe ku parçeyek ji laşê xwe jî dabe; dibe ku niha berpirsyarekî girs jî be... lê rewşa wî/wê çi dibe bila bibe, ti hinceta bikarneanîna zimanê dayîkê û biçûkdîtina wê nîn e.

Îroj bikaranîna zimanê kurdî pîvaneke şoreşgertiyê ye. Berya deh salan, bîst salan me digot: ``Em di şer de ne, derfeta me nîn e ku em xwe perwerde bikin, emê piştî şoreşê kurdî li pêş bixin!``

Ê ka? Me bi dehan şoreş li Kurdistanê pêk anîn, lê hevalê me hîn jî dev ji tirkî bernade. Derfeta wî/wê ji heye. Li metropolan e, yan li Ewropa ye, yan jî di saziyekê de ling avêtiye ser ling. Hevalên ku rojê 24 saetan di eniyê de şer dikin, di operasyonan de derfetê nabînin gezeke nan bixwin; perwerdeya xwe bi kurdî dibînin, axaftina xwe bi kurdî dikin; lê hevalên me yên li Ewropa di nava xêr û xweşiyê de, bi dûvê tirkî girtine, di devê xwe de kirine qajik û dev jê bernadin. ``Heval ev tiştê hûn dikin ne rast e!`` We bi vê israra xwe ya di tirkî de malik li gel jî, li partiyê jî xera kir. Gel dibêje; zarokên me li komeleyê hîni tirkî bûn! Ev bi rastî şermeke mezin e.

Û xwezî zimanê tirkî zimanekî ji kurdî baştir, delaltir, kevintir, bi bingehtir û di warê rêziman û axaftinê de dewlemendtirbaya minê bigota, ``Dê bavo zimanê me lawaz e, yê tirkî behr e, ji bo wê ka em biçin ser ola wan``. Lê em dizanin ku ne wiha ye. Zimanê kurdî sed taq ji zimanê tirkî dewlemendtir, xweştir, zelaltir û bi bingehtir e.

Ne ku ez zimanê tirkî biçûk dikim, lê bi rastî zimanê tirkî zimanekî çêkar e. Ji xwe re li hev anîne. Pîne kirine. Ji erebî, farisî, kurdî, inglîzî, frensîzî, almanî, îtalî û welhasil ji her zimanî girtine û bi hev ve zeliqandine û zimanek çêkirine, xistine devê kurdên me gotine dê aha ji xwe re qajikek pê bilîzin û kurdê me jî pê ve zeliqî ne û dev jê bernadin.

Êdî bes e. Bi rastî bes e. Kurdekî bi salan e, di nava derfetên hînbûnê de dijî û tevî vê xwe fêrî zimanê dayîka xwe nake û di bikaranîna tirkî de israr dike ew çi kes dibe bila bibe, rutbeya wî çiqasî mezin dibe bila bibe, ew li hemberî neteweya xwe di nava gunehbarî û sûc de ye. Ti mafê kesî nîn e ku bi destê xwe netewa xwe asîmîle bike.

Bi vê sedemê ji bo kesên di bikaranîna tirkî de israr dikin û kurdî li gorî xwe biçûk dibînin, min lêkolînek kir û li jêrê nivîsandineke amade kir. Di vê nivîsandinê de cudahiyên di navbera zimanê kurdî û yê tirkî de min xwest di çend xalan de be jî raxînim ber çavan. Ger ew mirov, ew kes bi rastî ji zimanan têdigihêjin, wê di vê nivîsandinê de dewlemendiya zimanê kurdî û çêkariya zimanê tirkî bibînin û rojek berya rojekê ji şaşitiya tê de ne vegerin û xwe fêrî bikaranîna zimanê kurdî bikin, xwe jî şerma salan rizgar bikin.

Hêvîdar im ku ew kes nebêjin, ``Mamoste te çima ev nivîs bi tirkî amade nekir``. Min romanek bi kurdî nivîsand. Dibêjin, ``Ku bi tirkî ba me dê bixwenda. Em bi kurdî fêm nakin!`` Kurdek çawa dikare vê gotinê bi hêsanî bêje û ji gotina xwe şerm neke; bi rastî ez têngihêjim. Qasî tê bîra min, berê li cem me dema kesek diçû leşkertiye û dema vedigeriya, ku bi tirkî bipeyivîba herkesî tevza xwe pê dikir û pê dikenyan. Em diçûn dibistanê fêrî tirkî dibûn, dihatin malê me nediwêrî peyveke bi tirkî biaxivin. Me digot, dayîka me bavê me, wê bi me bikene, bi me de bixeyide. Niha wiha lê hatiye ku yek bi kurdî diaxive tevza xwe pê dikin. Çawa ku sazûmana tirkitiyê her tiştê li ser vê xakê berûvajî kiriye, ev yek jî wiha berûvajî kir.

Kurdek dema bi zimanê dayîka xwe neaxive û di axaftina bi tirkî de israr bike, divê ji xwe şerm bike. Asîmîlebûn angoyan nizanîbûna zimanê kurdî ne şerm e, lê dema ku derfetê hebe, vegera ser zimanê xwe, fêrbûn û bikaranîna zimanê xwe ku ji xwe re neke

bingeh ev şerma herî mezin e. Heta ku kurd ji bikaranîna tirkî şerm nekin û bi bikaranîna kurdî xwe serbilind nebînin, ne kurd ne ji Kurdistan azad û rizgar nabe. Hêvî dikim ku ev nivîs hinekî bala van kesan di bikaranîna tirkî de israr dikin bikişîne ser zimanê dayîka wan...

**CUDAHIYÊN DI NAVBERA ZIMANÊ KURDÎ Û YÊ TIRKÎ DE**


		<b>KURDÎ</b>	<b>TIRKÎ</b>
1	Malbata Ziman (dil ailesi)	Îndo-Ewropî	Ural-Altay
2	Zayenda navan(dilde cinsiyet)	Heye	Nin e
3	Guhertina rehê lêkerê(fiilde kok degisimi)	Heye	Nin e
4	Tewangbarî (bükülme)	Heye	Nin e
5	Cînavk (pronomen)(zamir)	Du cure	cureyek
6	Lêker(fiil)	Du cure 1-Bireserê digre 2-Bireserê nagre	Yek cure
7	Qertaf (suffix) (ek alma)	Tên pêş, paş û nava lêkerê	Tenê paşya lêkerê
8	Peyv (kelime yapisi)	Dikare bi du, sê dengdaran destpê bike û dema bi tena xwe be wateya yekjimar û wateya pirjimarî dide	Tenê bi dengdarekê despê dike û ji bo yekjimar û pirjimar cuda tên nivîsandin
9	Pêveber (yuklem acisindan)	Pirahî di nava hevokê de cih digre	Her dem li dawiya hevokê
10	Kitbûn û kombûn (tekil cogul acisindan)	Li ser lêkerê çêdibe	Li ser navdêr û lêkerê çêdibe
11	Rengdêr (sifat acisindan)	Li paş navdêrê tê	Li pêşya navdêrê tê
12	Hevoksazî(cumle kurulusu acisindan)	Li gorî demê rêz dibe	Ne li gorî demê rêz dibe
13	Cînavkên xwedîtîyê (iyelik zamirleri acisindan)	Ji pêş ve pêvekan digre	pêvekan li pey xwe zêde dike


1- Malbata zimanê kurdî Indo Ewropî ye: Di nava vê malbatê de zimanên wekî Îngilîzî, Almanî, Fransîzî, Farisî, Kurdî hene. Ji bo vê di van zimanan de gelek peyv û rêzikên hevbeş hene. Mînak: Guhertina rehê lêkerê û zayenda peyvên rêzikeke hevbeş e. Ji van peyvên jêrîn jî em dikarin hevbeşiyê bibînin:

KURDÎ	ÎNGILIZÎ	ALMANÎ	FRANSIZÎ	FARISÎ	GREKÎ	TIRKÎ
<b>Stêr</b>	<b>Star</b>	<b>Stern</b>	<b>Astre</b>	<b>Stare</b>	<b>Astron</b>	<i>Yıldız</i>
<b>Kurt, kin</b>	<b>short</b>	<b>kurz</b>	<b>court</b>	-	-	<i>kısa</i>
<b>lêv</b>	<b>lip</b>	<b>lippe</b>	<b>levre</b>	<b>leb</b>	-	<i>dudak</i>
<b>dilop</b>	<b>drop</b>	<b>tropfen</b>	-	-	-	<i>damlâ</i>
<b>nav</b>	<b>Name</b>	<b>name</b>	<b>nom</b>	<b>name</b>	-	<i>Ad, isim</i>
<b>no/na</b>	<b>no</b>	<b>nein</b>	<b>non</b>	-	-	<i>Hayır,</i>
<b>tu</b>	<b>you</b>	<b>du</b>	<b>Tu/te</b>	-	-	<i>sen</i>
<b>nû</b>	<b>new</b>	<b>neu</b>	<b>neu</b>	-	-	<i>yenî</i>
<b>neh</b>	<b>nine</b>	<b>neun</b>	<b>neuf</b>	-	-	<i>dokuz</i>
<b>bra</b>	<b>brother</b>	<b>bruder</b>	-	<b>birader</b>	-	<i>Kardeş, abi</i>
<b>Kom</b>	<b>committee</b>	<b>komitte</b>	<b>Comité</b>	-	-	<i>topluluk</i>
<b>şerm</b>	<b>shame</b>	<b>scham</b>	-			<i>utanma</i>
<b>erd</b>	<b>earth</b>	<b>erde</b>				<i>Dünya, yer</i>

Lê zimanê tirkî jî malbata Ural-Altay e; zimanên di vê malbatê de; Fînî, Macarî, Ûygûrî, Moxolî, Tirkî ne. Taybetmendiyên vê malbata ziman û yên malbata zimanê Îndo-Ewropî gelekî jî hev cudatir in. Di dara malbata zimanan de em dikarin bibînin:

# NEXŞEYA MALBATÊN ZIMANAN





2- Zayenda navan : Di zimanê Kurdî de her nav ango her peyv xwedyîyê zayendekê ye. Dema bi tena serê xwe be zayenda wê ne li ber çav e, lê dema di hevokê te tê bikaranîn zayend xwe diyar dike. Her peyv an nêr an jî mê ye. Di zimanê tirkî de ev taybetî tineye.

Zilam : zilamê dirêj (maskulîn)

Jin : jina xweşik (femînin)

Adam : uzun adam

Kadin : güzel kadin

Tê dîtîn ku di kurdî de, peyva nêr bi tîpa `ê`, peyva mê bi tîpa `a` hatiye tewandin û zayenda xwe diyar kiriye. Lê di tirkî de peyv çawa bin wiha hatine cem hev, tiştek lê zêde nebûye û zayend ne diyar e.

KURDÎ	TIRKÎ
Sêva sor (feminin/ dişil)	Kırmızı elma (nêr an mê ne diyar e)
Xaniyê bilind (maskulin/ eril)	Yüksek bina (nêr an mê ne diyar e)
Rêka dirêj	Uzun yol
Temenê kin	Kısa ömür

3-Di zimanê kurdî de, dema lêker tê kişandin rehê wê tê guhertin. Lê di tirkî de nayê guhertin.

Kurdî				Tirkî			
Lêker	Dema Borî	Dema Niha	Dema bê	fiil	Geçmiş zaman	Şimdiki zaman	Gelecek zaman
<b>KIRIN</b>	Min <b>kir</b> , te <b>kir</b> , wî <b>kir</b> , wê <b>kir</b> , me <b>kir</b> , we <b>kir</b> , wan <b>kir</b>	Ez <b>dikim</b> , tu <b>dikî</b> , ew <b>dike</b> , em <b>dikin</b> , hûn <b>dikin</b> , ew <b>dikin</b>	Ezê <b>bikim</b> , tê <b>bikî</b> , ewê <b>bike</b> , emê <b>bikin</b> , hûnê <b>bikin</b> , ewê <b>bikin</b>	<b>YAPMAK</b>	Ben <b>yaptım</b> , sen <b>yaptın</b> , o <b>yaptı</b> , biz <b>yaptık</b> , siz <b>yaptınız</b> , onlar <b>yaptılar</b>	Ben <b>yapıyorum</b> , sen <b>yapıyorsun</b> , o <b>yapıyor</b> , biz <b>yapıyoruz</b> , siz <b>yapıyorsunuz</b> , onlar <b>yapıyorlar</b>	Ben <b>yapacağım</b> , sen <b>yapacaksın</b> , o <b>yapacak</b> , biz <b>yapacağız</b> , siz <b>yapacaksınız</b> , onlar <b>yapacaklar</b>
<b>HATIN</b>	Ez <b>hatim</b> , tu <b>hatî</b> , ew <b>hat</b> , em <b>hatin</b> , hûn <b>hatin</b> , ew <b>hatin</b>	Ez <b>têm</b> , tu <b>têyî</b> , ew <b>tê</b> , em <b>tên</b> , hûn <b>tên</b> , ew <b>tên</b> !!!	Ezê <b>werim</b> , tê <b>werî</b> , ewê <b>were</b> , emê <b>werin</b> , hûnê <b>werin</b> , ewê <b>werin</b> !!!	<b>GELMEK</b>	Ben <b>geldim</b> , sen <b>geldin</b> , o <b>geldi</b> , biz <b>geldik</b> , siz <b>geldiniz</b> , onlar <b>geldiler</b>	Ben <b>geliyorum</b> , sen <b>geliyorsun</b> , o <b>geliyor</b> , biz <b>geliyoruz</b> , siz <b>geliyorsunuz</b> , onlar <b>geliyorlar</b>	Ben <b>geleceğim</b> , sen <b>geleceksin</b> , o <b>gelecek</b> , biz <b>geleceğiz</b> , siz <b>geleceksiniz</b> , onlar <b>gelecekler</b>
<b>DÎTIN</b>	Min <b>dît</b> , te <b>dît</b> , wê <b>dît</b> , wî <b>dît</b> , me <b>dît</b> , we <b>dît</b> , wan <b>dît</b>	Ez <b>dibînim</b> , tu <b>dibînî</b> , ew <b>dibîne</b> , em <b>dibînin</b> , hûn <b>dibînin</b> , ew <b>dibînin</b> !!!	Ezê <b>bibînim</b> , tê <b>bibînî</b> , ewê <b>bibîne</b> , Emê <b>bibînin</b> , hûnê <b>bibînin</b> , ewê <b>bibînin</b> !!!	<b>GÖRMEK</b>	Ben <b>gördüm</b> , sen <b>gördün</b> , o <b>gördü</b> , biz <b>gördük</b> , siz <b>gördünüz</b> , onlar <b>gördüler</b>	Ben <b>görüyorum</b> , sen <b>görüyorsun</b> , o <b>görüyor</b> , biz <b>görüyoruz</b> , siz <b>görüyorsunuz</b> , onlar <b>görüyorlar</b>	Ben <b>göreceğim</b> , sen <b>göreceksin</b> , o <b>görecek</b> , biz <b>göreceğiz</b> , siz <b>göreceksiniz</b> , onlar <b>görecekler</b>

4 Di zimanê kurdî de tewangbarî heye. Di zimanê tirkî de nîn e.

Xanî + sor + bilind = Xaniyê sorî bilind

Bina + kirmizi + yüksek = Kirmizi yüksek bina

Hesp + gewr + bezek = Hesp~~a~~ gewrî bezek

At + gri + koşucu = Gri koşucu at

Zilamê çê            iyi adam  
Gula sor            kirmizi çiçek  
Gulên sor            kirmizi çiçekler  
Guleke sor            bir kirmizi çiçek

5 -Guhertina cînavkan di zimanê kurdî de heye, di zimanê tirkî de tineye. Ji ber ku di zimanê kurdî de du cureyê lêkeran heye.

Lêkerên bireserê digrin û lêkerên bireserê nagrin; dema lêkerên bireserê digrin, di dema borî de werin bikaranîn, ji ber ku nikarin werin kişandin, kirdeyê diguherînin. Bi vî awahî cînavk jî tên guhertin. Rewşeke wiha derdikeve holê.

KIRIN (machen/yapmak), DÎTIN (sehen/görmek), XWARIN (essen/yemek) û lêkerên din wiha ne. Di dema borî de rehê wana ji bo hemû kesan wekî xwe dimîne.

Min kir.            Ich habe gemacht./Ben yaptım.  
Te kir.            Du hast gemacht./Sen yaptın.  
Wê kir. (ji bo mê)    sie,es hat gemacht./ O yaptı.  
Wî kir.(ji bo nêr)    er, es hat gemacht./O yaptı.  
Me kir.            Wir haben gemacht./Biz yaptınız.  
We kir.            Ihr habt gemacht./Onlar yaptılar.  
Wan kir.            Sie haben gemacht./Onlar yaptılar

Lêkerekê objekt nagre di dema borî de cuda tê kişandin:

HATIN (kommen/gelmek), ÇÛN (gehen/gitmek) û lêkerên din bi ez, tu, ew, em, hûn, ew tên kişandin.

KURDÎ	ALMANÎ	TIRKÎ
Ez hatim.	Ich bin gekommen.	Ben geldim.
Tu hatî.	Du bist gekommen.	Sen geldin.
Ew hat.	Er, sie, es ist gekommen.	O geldi.
Em hatin.	Wir sind gekommen.	Biz geldik.
Hûn hatin.	Ihr seid gekommen.	Siz geldiniz.
Ew hatin.	Sie sind gekommen.	Onlar geldiler.

6 Di zimanê kurdî de Lêker du cure ne. Hinek ji wana bireserê (objekt/nesne) distînin, hinek nastînin. Bi vê sedemê ev taybetmendî di sazkirina hevokê de jî bandora xwe li ser hevokê çêdike. Kombûna hevokê di kurdî de li ser lêkerê çêdibe. Lê lêkerên bireserê digrin kom jî nabin, navdêrê dikin kom. Dîsa lêkerên bireserê digrin, di dema borî de nayên kişandin û kirdeya xwe didin tewandin û cînavkan diguherînin.

Xwarin, dîtin, kirin, anîn, xistin, lêdan.... Lêkerên bireserê digrin in.  
Rabûn, çûn, hatin, ketin, razan, .... Lêkerên bireserê nagrin in.

7- Di zimanê kurdî de lêker dikarin pêvekan (qertaf) bikrin pêşiya xwe, nava xwe û dawiya xwe. Lê di tirkî de tenê dikarin bigrin dawiya xwe.

**Meşin:** Ez **dimeşim**. *Rehê lêkerê `meş` qertaf girtiye hem pêşiya xwe, hem paşiya xwe. **Yürümek**. Ben **yürüyorum**. Rehê lêkerê `yürü` qertaf tenê girtiye paşiya xwe.*

**Vexwarin.** Ez **vedixwim**. Rehê lêkerê `vexwar` qertaf girtiye nava xwe. **İçmek**. Ben **çıyorum**. Rehê lêkerê `iç` qertaf girtiye dawiya xwe.

Di zimanê kurdî de bi gelek awayan mirov dikare lêkeran biafirîne. Di zimanê tirkî de ev bi sînor e. Ji ber ku di zimanê kurdî de qertafên lêkerê hene. Lê tirkî tenê ji rehê lêkerê dikare were zêdekirin.

Wekî: ve: vegotin, vekolîn, vexwarin, veşartin, vejîn, vepexirandin....

Lê: lêkolîn, lêgerîn, lîstîn, lêxistin, lêkirin,

Li :li hev kirin, li hev hatin, li ber gerîn, li xwe kirin....

Çê: çêkirin, çêbûn...

Ra: rakirin, razan, raxistin, radestkirin....

Dan : berdan, lêdan, badan, dadan, avdan, guhdan, mizdan, kefdan....

Van : şivan, gavan, govan, mêvan, dilovan, xwendevan, şervan, zêrevan...

8- Di zimanê kurdî de peyv dikarin ji du , sê dengdaran (konsonant/sessiz harf) pêk werin û peyv dema bi tena xwe bin him wateya kom, him a kit didin. Di zimanê kurdî de her peyv an nêr an mê ye. Ev taybetmendî tev jî di zimanê tirkî de nîn in.

**Şkeft** : magara

**Stran** : şarki

**Skrat** : ölüm anî

Sêv : wateya sêvekê jî, wateya gelek sêvan jî dide.

Zarok: wateya zarokekî jî, wateya gelek zarokan jî dide.

Wî sêvek anî.: O bir elma getirdi.. Hevoka kit. Tekil cümle.

Wî sêv anîn.: O elma**lar** getirdi. Hevoka kom. Çogul cümle.

**Mala** me. Bizim evimiz. Mal peyveke mê ye. Ev dişil bir kelimedir. Haus ist ein feminin Wort.

**Xaniyê** me. Bizim konutumuz. Xanî peyveke nêr e. Konut eril bir kelimedir. Gebäude ist ein maskulin Wort.

9 – Di zimanê kurdî de pêveber di hundirê hevokê de cih diguhere. Pirahî li nêvî û hin caran jî li dawî cih digre, lê di zimanê tirkî de her gav li dawî ye.

Ez çûm sûkê. KIRDE (ÖZNE) + PÊVEBER (YÜKLEM) + TÊRKER (TUMLEÇ)

Ez diçim sûkê.

Ezê biçim sûkê.

Ben çarşıya gittim. ÖZNE + TUMLEÇ + YÜKLEM

Ben çarşıya gidiyorum.

Ben çarşıya gideceğim.

Lê dema hevok bi lêkerên bireser (objekt) digrin were sazkerin pêveber diçe dawî.

Min nan xwar. KIRDE + BIRESER + PÊVEBER

Ez nanî dixwim.

Ezê nên bixwim.

10- Di zimanê kurdî de kitbûn û kombûn xwe li ser lêkerê dide diyarkirin. Lê di lêkerên bireserê digrin de nav kom tê diyarkirin, wê demê jî lêker kit dimîne.

Ew sê**van** tî**nin**. On**lar** elm**lari** getiriyor**lar**.

**Wan** sêv anî. On**lar** elmayi getirdi**ler**.

**Wan** sêv an**in**. On**lar** elm**lari** getirdi**ler**.

Ew diçe mala xwe. On evîne giddiyor.

Ew diç**in** mala xwe. On**lar** ev**lerine** gidiyor**lar**.

Zarok meşiya. Çocuk yürüdü.

Zarok dimeş**in**. Çocuklar yürüdü**ler**.

11- Di zimanê kurdî de rengdêr li pey navdêrê cih digrin û zayenda navdêrê eşkere dikin. Di zimanê tirkî de li pêşiya navdêrê cih digrin û nikarin zayendê eşkere bikin.

KURDÎ			TIRKÎ		
NAVDÊR	RENGDÊR	HEVTEMAMKIRIN	ISIM	SIFAT	TAMLAMA
sêv	sor	Sêva sor (mê/feminin/dişil)	elma	kirmizi	Kirmizi elma (bê zayend/cinsiyetsiz/notr)
derî	spî	Deriyê spî (nêr/maskulin/eril)	kapi	beyaz	Beyaz kapi (bê zayend/cinsiyetsiz/notr)
rê	dirêj	Rêka dirêj (mê/feminin/dişil)	yol	uzun	Uzun yol (bê zayend/cinsiyetsiz/notr)
zilam	westiyayî	Zilamê westiyayî (nêr/maskulin/eril)	adam	yorgun	Yorgun adam (bê zayend/cinsiyetsiz/notr)
Sêv	sor	Sêvên sor	elmalar	kirmizi	Kirmizi elmalar
derî	spî	Deriyên spî	kapılar	beyaz	Beyaz kapılar

12- Di zimanê kurdî de hevoksazî li gorî çêbûna dema bûyer û çalakiyan tê sazkirin. Di zimanê tirkî de ev yek ne wiha ye. Ez diçim Sûkê. Ben çarşiya gidiyorum. (Di kurdî de rêz li gorî demê ye. Destpêkê `ez- kirde/ subjekt`, pişt re `diçim-pêveber/yuklem`, pişt re `sûkê/bireser` rêz bûye. Heta neçim, nikarim bigihêr sûkê. Lê di hevoksaziya tirkî de, hîn nemeşiyaye, digihêje sûkê.)

13- Cînavkên xwedîtîyê di zimanê kurdî de pêvek ango qertafan ji pêş ve digrin, lê di zimanê tirkî de pêvek ango qertaf ji paş ve li ser cînavkê tên zêdekirin.

KURDÎ	Tirkî	KURDÎ	Tirkî
<b>A</b> min/ <b>ya</b> min	Ben <b>imki</b>	<b>Yên</b> min	ben <b>imkiler</b>
<b>A</b> te/ <b>ya</b> te	Sen <b>inki</b>	<b>Yên</b> te	sen <b>inkiler</b>
<b>A</b> wî/ <b>ya</b> wî	On <b>unki</b>	<b>Yên</b> wî	on <b>unkiler</b>
<b>A</b> wê/ <b>ya</b> wê	On <b>unki</b>	<b>Yên</b> wê	on <b>unkiler</b>
<b>A</b> me/ <b>ya</b> me	Biz <b>imki</b>	<b>Yên</b> me	biz <b>imkiler</b>
<b>A</b> we/ <b>ya</b> we	Siz <b>inki</b>	<b>Yên</b> we	siz <b>inkiler</b>
<b>A</b> wan/ <b>ya</b> wan	Onlar <b>inki</b>	<b>Yên</b> wan	onlar <b>inkiler</b>

Amadekar: Hesên Huseyîn Denîz

Lêkolîn : ji Pirtûka Rênişanêra Vegotina Kurdî û li ser înternetê ji Weşanên Instutiya Kurdî ya Stenbolê

Li gel silav û rêzên germ.

27/11/2009